R’ÊJÎMA BAASÎ YA SÛRÎYAYÊ K’ET – EV DAWÎ BÛ, AN – DESTPÊK A NÛ?!

Ji dijminan metirse – ya here xirab, a ku ew dikarin bikin, ew e, ku te bikujin. Ji dostan metirse – ya here xirab, a ku ew dikanin bikin, ew e, ku xiyanet li te bikin. Ji mirovên bêdeng bitirse – ewana nakujin û xiyanetê nakin, lê her bi destûrdana wan a bêdeng e, ku îro li r’û vê cîhanê xiyanet û kuştin hene.

Brûno Yasênskîy – nivîsk’ar, helbestvan û şanonûsê polonî û sovêtî.

Ezîz ê Cewo

... Belê, r’êjîma baasî ya Beşar Esed li ber êrîşên k’omên ç’ekdar ên îslama r’adîkal ên bi serk’êşîya Hayat T’ahrîr eş-Şamê (HTŞ) hevtê û nîvekê jî li ber xwe neda. Hêzên r’êjîmê yên leşkerî, sazîyên ewlek’arîyê yên t’aybet an r’evyan (hinekan heya ç’ek û cilên xwe yên leşkerî jî avîtin!), hinek jî, bêyî ku dest li ber xwe hildin, xwe r’adestî hêzên dijber kirin…

Ev pêvajoyek e dîrokî ye, ya ku bi serê xwe ji hemû hêlan va hêjayî nirxandin û analîzên k’ûr û dûr e. Lêk’olînerên siyasî, r’ojnameger û kesayetîyên cuda yên pispor û şareza, ên ku an ev bûyerên dîrokî li ber ç’avê xwe dîtine, an jî ew şopandine, dê di vê derbarê da hîn gotina xwe bibêjin û, dibe ku, em – k’urd jî ji van hemûyan dersên dîrokî derxin...

Helbet, ev hemû mijarên pêşer’ojê ne! Lêbelê, îro, bi dîtina min, di vê re’wşa aloz da ji bo me – k’urdan divê her pirsek guncan û girîng be: k’a di vê r’ewşê da em – k’urd, dê, wek net’ew, çawa t’evbiger’in, k’a, gelo, emê vê carê jî (dîsa wek net’ew!) wan şaşîyan dubare nekin, ên ku pêşîyên me sed salî berê kirine?!

Lewra jî, ezê li vira ne ewqasî di derbarê bûyerên pêkhatî da biaxivim, çiqasî di derbarê helwest û hewlên me – k’urdan ên di vê pêvajoya gelemp’erî da gotina xwe bibêjim û hinek têbînîyên xwe pêşk’êşî bala r’aya giştî bikim. Lewra ku encama vê pêvajoya cîhanî, ya ku di herêma R’ojhilata Navîn da destpê bûye, encamên wê ji gelek hêlan va dê p’abendî helwest, hewl û t’evgerbûna k’urdan be …

Û divê hema di sêrî da bê gotin, ku ew bûyer, ên ku îro li Sûrîyayê pêk tên, ne encama şer’ê navxweyî ne (her îro!), û pêvajo jî, ne ewqasî herêmî ye, çiqasî cîhanî ye, lewra ku hêzên cîhanî an r’astedêr, an jî li pişt p’erdeyê va beşdarî amadekirina van bûyeran bûne, îro jî wan t’evger dikin û r’êvedibin… Lê Sûrîya vê serdemê dê bêyî şer’ û pevçûnên navxweyî nemîne: hemû merc êdî gihîştine, ku ew pêk bên. Her sedemek a biçûk pêwîst dike, ji bo ku ew agirê navxweyê pê bigire. Û dibe ku hema ew jî bibe sedema p’arç’ebûna vî welatî!

Wek ku di cîhanê da r’ikber û dijminên vê r’êjîmê hebûne, wisa jî – dost û hevpeymanîyên wê. Û ev herdu t’eref jî di vî welatî da berjewendîyên xwe hebûne û îro jî hene. Her dewletek di nava Sûrîyayê da dost û dilsozên xwe hebûne û îro jî hene (welatîyên sade, siyasetmeder, r’ayedarên dewletê, nûnerên leşkerî yên p’ayabilind û h.w.d.), ên ku bi wana r’a di nava hevk’arîyê da bûne. Û piştî k’etina r’êjîma Esed p’ir’anîya wana di cîhekî da neçûne, an betavenebûne. P’ir’anîya wana li Sûrîyayê ne, û ewê anegorî têgihîştin, hest û bawerîyên xwe hê helwesta xwe dyar bikin. Di ser van da îro di Sûrîyayê da wisa jî k’omên cuda ên ç’ekdarên îslama r’adîkal (yên DAÎŞ-a berê), ên ji derva hatî zêde bûne – û beşek ji vana dê bibin desthilatdar (wek Hayat Tahrîr eş-Şamê!), hinek ji wan jî dê derî pêwîstîyên pêvajoyê û bêp’ar bimînin, û li vira dê dest bi dijberî, nak’okî û p’evçûnên berjewendîyên cuda bibe!

Û, wek ku tê zanîn, dewlet jî, hema ji bo wê dewlet in, ku hemû r’engî sazîyên xwe

hene, yên ku ji bo p'arastina berjewendîyên wê yên dewletî r'ê û r'êbazan diger'in û wan dip'arêzin…

Ev, wek prênsîp, ji bo têgihîştina r'ewşa heyî – bi giştî!

Û, lewra jî dê ne r'ast be, eger mirov van bûyeran bi êrîşên van çend hevtêyên vê dawîyê binirxîne. Ew êrîş hema wisa bi carekê va ji cîhekî dernek'etine û pêk nehatine: bi mehan, heya bi salan, amedek'arîyên wan hatine kirin, dewletên mezin ên cîhanî, ne ku t'enê di derbarê wan amadek'arîyan da haydar bûne, lê ew hemû di bin ç'avdêrîya wan û bi beşdarbûna nûnerên wan a çalak da pêk hatine – ew li pişt p'erdeyê va bûye, an r'astedêr, zêde ne girîng e! Û ya ku paşê, qaşo, bi carekêva r'ûdaye û pêk hatye, an dê hîn pêk bê, ew êdî têatro ye – têatroya ji bo civaka cîhanî – wek bînêran!



Peymana Sayk's-Pîko. Binenimûneya xerîteyê. 16. 05. 1916.

Wek ku tê xuyan, di cîhanê da dest bi pêvajoya guhar'tina p'ergala R'ojhilata Navîn a heyî bûye, ya ku destpêka sedsala XX (1916) dewletên mezin bi hevhatinek a bi navê "Peymana Sayk's-Pîko" li herêmê û cîhanê ferz kirine. Wê demê, anegorî wê Peymana veşartî (16-ê gulana sala 1916-an) ya di navbera hukumetên Brîtanîya Mezin, Fransayê, Împêratorîya R'ûsîyayê û paşê, hê dereng, ya Îtalîyayê da, sînorên herêmên berjewndîyên dewletên mezin ên piştî Şer'ê Cîhanê yê Yekem li R'ojhilata Navîn hatine dyarkirin (li xerîteyê jorê binihêr'in)! …

Helbet, piştî ku Şer'ê Cîhanê yê Yekem dawî dibe, Peymana Lozanê tê, û encamên wê jî, jixwe tên zanîn: vê carê K'urdistan tê çarp'arç'ekirin. Û di encama vê bêdadîyê da

ev êdî sedsalek e, ku gelê k'urd bê navber zulm û zorê dibîne, li hember wî t'evkujî pêk tên, û di cîhanê da ev hemû wek "Trajêdîya gelê k'urd" tê zanîn …

Lêbelê, ne bes e, ku cîhan (bixwîne – dewletên mezin!) li hember vê bêdadîyê ker' û kor û lal dimîne, em jî hîn nikarin xwe ji şaşîyên pêşîyên xwe r'izgar bikin, li hev bicivin, Yekîtêya Net'ewî ava bikin, û xwe ji vê r'ewşa bindestîyê, bêmafîyê û bêr'ûmetîyê derînin…

Û, weha, piştî sedsalekê dem pêr'a gihîştye, ku ew p'ergala herêmê ya dijmirovî bê guhar'tin, lewra ku ewê hîç tiştekî baş ne ji gelên herêma R'ojhilata Navîn r'a, ne jî ji t'avahîya cîhanê r'a neanye. Û, ji ber vê jî, hem cîhan bi giştî, hem jî herêma R'ojhilata Navîn, bi t'aybet, êş û azarên wan guhar'tinan dik'işînin.

Lewra jî, k'a ji vir û pêva ev pêvajoyê çawa bidome, ne ku t'enê bi dewletên cîhanê ên mezin va girêdayî ye, lê, her weha, bi gelên herêmê bi xwe va jî, k'a ew çiqasî ji bo wan guhar'tinan amade ne, ji bo ku vê carê jî ç'arenûsa xwe bi destê dewletên mezin û dagerkerên herêmê yên mêtînger va bernedin. Jixwe, K'urdistan jî mêtîngehek a navnet'ewî ye, lewra ku her mêtîngerekî her beşekî wê bi hezar tayî bi dewletên mezin ên der va girêdayî ne û her gaveke xwe anegorî berjewendîyên wan diavêjin.

Gelê k'urd di vî warî da bi helwest û berxwedana xwe a li hember fişarên r'êjîmê, ji bo mafên xwe yên mirovî û net'ewî, û bi têk'oşêîna xwe ya bêhemp'a û lehengî ya li dijî DAÎŞ-ê da xuyan, ku ew, wek net'ew, ji bo ku ç'arenûsa xwe hilde destê xwe, êdî amade ye.

Lêbelê, piştî têkçûna r'êjîma baasî ya Beşar Esed serokk'omarê T'irkîyayê R'ecep T'eyîp Erdoxan daxuyand, ku armanca wî ew e, ku bajarên Sûrîyayê yên Heleb, Îdlîb, Şam û R'eqqayê bigihîne T'irkîyayê û bike beşekî wê… Jixwe k'omên ku piştî k'etina r'êjîma Sûrîyayê hatine ser desthilatdarîyê, bi nêzîk va têk'ilîyên wan bi r'êjîma faşîst a T'irkîyayê r'a hene. Wek ku tê xuyan, Erdoxan ji mêjva haş ji van bûyerên herêmê hebûye. Û di vê derbarê da hema-hema hemû sazîyên r'agîhandinê yên cîhanê diqîr'in û dibêjin, ku yê ku di vî şer'î da sûd wergirtye, Erdoxan e! ...

Helbet, ev bi serê xwe her t'erefekî r'astîyê ye, yê ku divê bê zanîn.

Lêbelê, ya ku di nava me da ne hemû kes in, ku dibînin, an jî, naxwazin bibînin, ew e, ku hinek siyasetmeder, sazî û r'êxistinên gelê me bi nêzîk va bi r'êjîma faşîst a T'irkîyayê r'a di nava hevk'arîyekê da ne, ya ku ji bo gelê k'urd xeterîyek a mezin e, lewra ku r'êjîma faşîst a Baxçelî-Erdoxan heya hebûna gelê k'urd, nav û mafên wî yên net'ewî jî r'ed dike. Û cîhê dilêşîyê û xemgînîyê jî ew e, ku hinek kes û kesayetîyên me – k'urdan heya wek peyayên Erdaxanê kujerê gelê k'urd û r'edk'arê hemû mafên wî yên mirovî û net'wî t'evdiger'in û îro li bûyerên R'ojavayê k'urdistanê bi ç'avê berjewendîyên r'êjîma T'irkîyayê dinihêr'in.

Û di vê r'ewşê da, ya ku mirov matma dike, ew e, ku hê jî ji nava hinek der-doran bang tên bihîstin, ku divê r'êvebirîya R'ojavayê K'urdistanê (PYD, HDS û R'êvebirîya xweswer) bi ENKSê r'a hev r'ûnîn bibin yek û bi hevr'a her'in Şamê. Heya hinek bang dikin, ku R'êvebirîya Xweser ya R'ojavayê K'urdistanê p'êwendîyên xwe ji PKKê qut bike, ji bo ku T'irkîya har nebe û li ser gelê k'urd da neyê! Hem jî, wek ku tê r'agîhandin, van r'ojên dawîyê nûnerên ENKS-ê di Hevlêrê da bi nûnerên Zanîyarîya (mûxabarat) PDK-ê û MIT-a T'irjîyayê r'a hev civyane, û li wira pirsa çûyîna ENKS a Şamê bi R'êvwbirîya Xweser r'a nirxandine...

Hema wisa!

Û li vira her gotinek a dapîrên me yên bihuştî tê bîra mirov: "Hey, xwelîserno!"

Ma ne, eger wisa be, wê demê dê hêsantir be, eger k'urd ji k'urdayetîya xwe jî dest bik'işînin, wê demê ewê, wek t'irk, bêyî êrîş û fişarên r'êjîma faşîst bijîn!

Hûn evê li gelê k'urd ferz dikin, erê?!

Ma, ev têk'oşîna T'evgera R'izgarîya Net'ewî ya van çil salên dawîyê ç'avên we li ser r'astîya dîrokê venekirin? Hûn heya îro jî tênegihîştin, ku pirsa PKK ne ku sedem e, lê her bahaneyek a bi dest (sûnî) hinaartî ye, ji bo ku gelê k'urd bê t'evgera sîyasî û p'arastin

bihêlin û k'arê xwe yê r'eş bi hêsane pêk bînin. We hîç nedaye heşê xwe, k'a ew r'êjîma faşîst çima ewqasî li dijî PKK ye? – Lewra ku dizane, ku îro hêza ku dikare êrîş û fişarên dagerkeran r'awestîne û gelê xwe bip'arêze, her PKK ye. Û ya ku pişta DAÎŞ-ê şkênand jî, dîsa PKK bû! Û DAÎŞ û r'êjîma faşîst a T'irkîyayê jî hema di destpêkê da xwe li hev girtine û bûne yekîneyeke hevtêk'el, ji ber ku Erdoxan hema di destpêkê da hêz û destek daye wan û îro jî ew ji hêla daîşîyan va wek emîrê DAÎŞ-ê yê ne formal tê dîtin. Û ev agahî li ber destê hemû dewletên mezin hene, hemma, vê qasê hemû bêdeng in! Çima? – Ev jî bi serê xwe pirsek e, ya ku pêdivîya xwe bi bersîvdanê heye. Û r'êjîma faşîst bi destpêkirina Doza Kobanîyê va, piştr'ast kir, ku ew dewleteke DAÎŞ-î ye! Û evê yekê jî dewletên mezin ên cîhanê baş dizanin, di destê wan da di vê derbarê da agahî û delîlên pêbawer, çiqasî bibêjî, hene, lê ew her xwe bi ker'î dibuhêrin... (Di vê derbarê da – bi hûrbînî di gotara min a "Heya Hîtlêr jî dê ji kirên Erdoxan tima bima" da, ya ku di bin sernavê giştî yê "Cîhana sewdaser – doza Kobanîyê" da hatibû weşandin – https://www.academia.edu/ 119856446/CÎHANA_SEWDASER_DOZA_KOBANÊ_ û https://amidakurd.net/ku/tekst/ CÎHANA_SEWDASER)

Dibe ku ewana jî lîstika xwe dilîzin? – K'î dizane?

Û pirsek a dinê jî – ma, serhildanên Şêx Seyîd, Seyîd R'iza, yên K'oçgirîyê, Ararartê, t'evkujîyên Geîyê Zîlan û yên dinê ji we r'a tiştekî nabêjin? Ma ew PKK-î bûne?... Sedem ne PKK ye, sedem hebûna gelê k'ird û daxweza wî ya mafên net'ewî ye! T'irkîyayê ji bo çi PKK kirye armanc? Ji ber ku ew baş dizane, ku têk'oşîna PKK-ê ya ji bo mafên t'evahîya gelên K'urdistanê ya here mafdar û bi hêz e! Ma ew têk'oşîna ne ji bo MAFÊN GELÊ KUR'D ÊN NET'EWÎ YE? Û r'êberî û serk'êşîya vê Daxweza Pîroz jî T'evgera R'izgarîya Net'ewî dike – bi r'êberîya bir'êz Ocalan! Û li ser r'êya destanîna van mafan jî PKK gorîdara gelê k'urd e – Gorîdara Leheng a bêhemp'a û pîroz!

Mesûd Barszanî li Maxmûran – bi fermandarên HPG r'a

Ma k'ê gelê k'urd û yên herêmê – bi giştî, li Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê, li R'ojavayê Kurdistanê, li Başûr (DAÎŞ wê demê êdî li ber dergehên Hewlêrê bû!) û li Şengalê ji êrîşên daîşîyan p'arastin! Ma we ji bîr kirye, k'a kek Mesûd çawa çû Maxmûran, ji bo ku spasîya xwe ji bo fermandarên HPGê bibêje…

Erê, erê, ew bi xwe çû Maxmûran, şûna ku wan lehengên gelê k'urd, ên ku Hewlêr û Şengal ji êrîşên DAÎŞÊ p'arastibûn, vexwenda qesra xwe, bi şêweyekî, ku demên wisa tê xwestin, ew pêşbazî bikirana – bi t'oren, bi r'êzgirtin, bi têlêvîzîon! Heya mafê hemwelatîyê yê r'ûmetê yê Başûr bida wan! Ez evê ne ji bo wê dibêjim, ji ber ku ew lehengana hewceyê pêşbazî û xelatkirineke wisan in. Na! Ji bo ku nivşên me yên dihatûyê li ser mînakên lehengîyên wan mezin bibin – ji bo pêşer'oja gelê me!

Lê, li şûna vê, piştî demekê r'êvebirîya herêmê ya pedekeyî ji wan daxwez dike, ku ew ji Herêma Başûrê K'urdistanê derên! – Hûn dibihên? Ên ku ew p'arastin, û îro jî wan dip'arêzin û ji bo p'arastina wana p'akr'ewan dibun, divê ji Başûr – ji p'arç'eyekî welatê xwe derên, a ku ewan biraderana kirine fazend / malîkaneya malbeta xwe, û r'êvebirîya Başûr li şûna wan p'arazvanên gel û welatê xwe ji 40-î zêdetir baregehên leşkerî û sîxurî yên r'êjîma faşîst a T'irkîyayê anîne û di herêmê da cîh kirine. Û ew dagerkerana jî qerf û t'ir'aneyên xwe li pêşmergeyên k'urd dikin, wan nuxsan dikin, ên ku bi fermana serekfermandarê xwe – kek Mesûd, mil bi mil bi wan r'a li dijî birayên xwe – gêrîllayên

HPG-ê şer’ dikin.

… Piştî demekê hinek ji wan fermandarên HPG-ê, yên ku Hewlêr û Şengal ji êrîşên daîşîyan P’arastibûn, bi lehengî p’akr’ewan bûn! Û ji kek Mesûd hîç dengek jî dernek’et, şûna ku, anegorî kevneşopîyên mirovî yên cîhanê, lehengên gelê k’urd bîr bianyana û di Hewlêrê da nîşangeheke bîranînê (peykerek) danyana, an jî navê wan li k’ûçe û meydanên bajêr bikirana – dîsa ji bo xatirê nivşên dihatûye! – Hemma, na, dê çawa tiştekî wisa bikirana, ma patr’onên wan ên ji r’êjîma faşîst a T’irkîyê dê çi ji wan r’a bigotana?!

Ev hê ne hemû ye! Hela serda jî îro Derîyê Sîmalkan ê di navbera Başûr û R’ojavayê K’urdistanê da girtî ye, r’êvebirîya Herêma Başûrê Kurdistanê destûrê nade, ku ji wir alîk’arîya mirovî (hûmanîtar) ji bo gelê R’ojava her’e…

De, îjar dibêjin – k’urd!

Îjar pey ewqasî r’a “R’ûdaw” tv bi devê Dilbixwîn Dara ji parlamênterê DEM partîyê yê Wanê dipirse, k’a R’êvebirîya xweser a R’ojava divê çi hewlan bide, çi bike, ku têk’ilîyên wê bi T’irkîyayê r’a wek ên r’êvebirîya Başûr bin!

Hema wisa!

Hûn tê digihîjin, k’a berê k’urdan didin k’u?!

Ango, r’êvebirîya R’ojavayê K’urdistanê jî, divê wek ya Başûr, têk’oşerên azadîyê, yên ku ji bo R’ojava têk’oşyane, an r’adestî r’êjîma T’irkîyayê bike (ji ber ku ew ji bo mafên gelên R’ojava têk’oşyane!), an jî wan ji R’ojavayê K’urdistanê derîne û li şûna wan baregehên leşkerî û sîxurî yên T’irkîyayê bîne – li wir cîh bike, û gêrîllayên YPG jî, wek pêşmergeyên Başûr, bi eskerên t’irk r’a mil bi mil li dijî birayên xwe yên k’urd şer’ bikin…

De, îjar were, û evê tê bigihîje!

Û, dema r’aman û mitaleyên min bi van bûyeran va gîro bûn, ji Ewropayê, ji dotek a gelê k’urd a hêja – Evîn Agirîyê du vidêo gihîştin ber destê min – herdu jî ji “R’ûdawê” derket’ibûn. Ev jî ji wan hevp’eyvînan bûn, ên ku Dilbixwîn Dara ji mirovne cuda r’a pêk anîbûn. Û di wan hevp’eyvînan da ew biradera hewl dide, tiştekî di wê derbarê da ji wan bibihê, k’a, ji bo ku yekîtîya k’urdan pêk bê, çi asteng hene! Û, wek ku tê xuyan, hinek tê digihîjin, k’a bersîvekê a çawa ji wan tê hêvîkirin, an jî, “R’ûdawê” hema di sêrî da dizanibûye, k’a hevp’eyvînê bi k’ê r’a pêk tîne... Lêbelê hinekan jî, bi xwezayî, bêyî r’ayê xwe hesabên wî t’evlihev kirine...

Ji wan vîdêoyan yek hevp’eyvîna bi Hesen Salih r’a bû. Û Dilbixwîn Dara hema di sêrî da banga wî mirovî ya ji bo serekfermandarê HSD-ê bir’êz Mezlûm Ebdî derxistye manşêtê: “... Divê HSD xwe ji PKK cuda bike!” https://youtu.be/LCp735A-Z14?si=Zv9HElNCc4_7SxvbD . Helbet, hevp’eyvînên li ser vê notê hatine avakirin, dîsa hene. Lêbelê, ez ji wana evê yekê wek mînak tînim, ji bo ku bê zanîn, k’a “R’ûdaw” propaganda çi dike û hewl dide, bi wê yekê di nava civakê da çi hewayê ava bike. Ev xeta wê ya bingehîn e, wek ku ewropî dibêjin – îdêa fîk’s!

Lê, divê bê zanîn, ku ji wî r’a hert’im li hev nayê, ku gotinên weha ji devê her kesî bik’işîne.

Hevp’eyvîna dûyem, a ku xwîşka hêja Evîn Agirîyê ji me r’a r’êkiribû, a bi çalakvana k’urd a ji Bêr’înê Zozan Elûşê r’a bû. Berî derbazî hinek têbînîyên di derbarê hevp’eyvînên vî r’engî da bibêjim, dixazim p’eyama Evîn Agirîyê li vir bînim: *“... Bi r’astî, ez ji helwesta “R’ûdawê” ecêb mame. Xeynî hevp’eyvîna bi kekê Hesen Salih r’e, min wisa jî li hininên din nihêr’î: ên bi hin siyasetmeder, akadêmîsyen û r’ewşenbîran r’e. Mirov ku wan dibihê, xemgîn dibe. Wê demê emê ji wan r’ûspîyan çi hîn bibin? Bi dîtina min, her yek ji me di vê r’ewşa welatê me da divê berîya her tiştî hewl bide, ku mirov û k’urd bimîne!*

Lê, bi r’astî bibêjim, vîdeoya bi Zozan Elûş r’e, hinekî bêhna min fireh kir, di nava vê tarîtîyê da ew ji bo min bû tîrêjek a hêvîyê: ku me hê sufetê xwe yê mirovî û net’ewî unda nekirye. Bi xwe bala xwe bidine: https://youtu.be/Ua1kWnrY5wI?si=_OBN6ppXcHmP0-eoc*”*

Û min jî bala xwe dayê û ez jî ji xwîşka hêja Evîn Agirîyê kêmtir matma nebûm...

Lê, her çi jî hebe, min bersîv û şiroveyên Zozan Elûşê wat'edar û hêja dîtin, lewra jî ezê hewl bidim, ewê bi t'omerî pêşk'êşî bala xwendevan bikim, ji ber ku ew manşêt, a ku Dilbixwîn Dara ji bo vê hevp'eyvînê avîtibûye, zêde tiştekî di derbarê naver'oka wê da (wek ku, em bibêjin, a Hesen Salih) nabêje, berovajî wê, wisa kirye, mirov tiştekî tê nagihîje. Bi xwe bala xwe bidin wê manşêtê: "Zozan Elûş: Kî çûye Şamê? divê biçin Qamişlo niha neçin Şamê". – Min tiştek ji vê manşêtê fêm nekir! Gelo we fêm kir? Helbet na! Û ji tiştên weha r'a jî dibêjin teknolojîyên qir'êj. Ma, gotinên dinê di axavtina Zozan Elûşa hêja da nîn bûne, ku bibûna manşêt? – Helbet hebûne – ew jî çiqas!? Hema ew ne anegorî xeta "R'ûdawê" ne... Lewra jî min li vira gotinên wê, bi giştî, ji bo we anîne, ji ber ku carna mirov hinek tiştan dibihê û derbaz dibe, lê dema wan dixwîne, li ser k'ûr dibe, baş dinirxîne, dipîve û wat'edar dike.

Fermo, bala xwe bidinê, k'a Dilbixwîn Dara çawa pirsên xwe şêwazdar dike, û Zozan Elûş jî çawa wan dibersivîne:

Dilbuwîn Dara:

– ... Ez dixazim, Zozan, bi te r'a meseleya lihevkirina k'urdî-k'urdî gotûbêj bikim. K'urd, li gor agahîyên li cem te, zanîyarîyên cem te, k'urd li Qamûşlo gihîştine r'êk'evtinekê?

Zozan Elûş:

– ... Bi r'astî, mesela k'urdî li Qamûşlû gelekî zehmet e, ku k'urd bibin îtîfaqekê bi hev r'a. Ji ber ku di herdu alîyan da jî muşkule hene.... Îtîlafa r'êjîmê bi eynî senarîoyê çû Şamê, xwestin ku Colanî bibînin, Colanî jî dibêje, ku wî hukumeta întîqalî çêkirye, ku ev hukum wê hukuma min îdare bike. Ku k'arê îtîlafê di vê hukumetê da t'une! ... Gor tê axavtin, wan Destûrek jî amadekirye... Dîsa jî, wek sûrî, em divê muhelewatên xwe bikin, îro firseteke dîrokî li pêş me heye, wek k'urd jî divê em wilo bifikirin.... Wek tê zanîn, eger bi hev r'a neçin Şamê wê t'u metfûqekî gelekî qewmî ji k'urdan dernek'eve. Naha dem ne dema berê ye. Dma berê quwetek hebû, helwesteke dijî DAÎŞ-ê hebû... ew r'ast e. Naha li Sûrî merheleyek nû derk'etye, divê em wê merhelê r'a r'ûmeta me hebe, wek k'urd. Eger r'ûmeta me t'unebe, emê windakin. Yanî bi vî şiklî, mantiqî, ku em difikirin: bi – ya *ez bim, ya kesekî dinê t'unebe, – emê winda bikin... Her weha jî k'urd divê ne t'enê ji bo mafên k'urdan bifikirin, divê hewldanê wan her weha ji bo dêmokratîbûna Sûrîyê hebe, ji ber ku...* – Zozan r'ewşa guhartinên dêmografîk a Sûrîyayê ya van salên dawîyê tîne ber ç'avan, lê li vira Dilbixwîn Dara gotin wê navber dike û dipirse.

Dilbixwîn Dara:

– Baş e, Zozan, ev çend r'oj in, emêrîkî, fransî li R'ojavayê K'urdistanê ne, li Qamûşlûyê ne, eşkere ye, yanê ne tiştekî veşarî ye. Dikin-nakin, nikarin li hev bînin, yanê cuda li gel Mezlûm Ebdî civyan, li gel PYNK-ê, PYD-ê û partîyên nû civyan, li gel ENKSê civyan. Lê heta nha ENKSê û partîyên din necivyane. Dixwazim vê buzanibim, bi r'astî, ji ber ku tu jinêzîkva agahdarî gelek tiştan î, li ser çi hev nakin, çima hev nakin?

Zozan Elûş:

– Bi r'astî, tiştê ku li ser hev nekin, t'une. Yanî (r'ewşeke) gelekî komîk e! tiştekî li ser li hev nekin, t'une. Her weha, herdu alî qala mafên k'urdan dikin, her weha, herdu alî qala zimanê k'urdî, her weha ji bo hiqûqê k'urdî, û, her weha jî, ji bo tiştên esasî heman in.

Belê, dema sêzdeh salên çûyî, me fehm kir, teqîbetên siyasî hebûn, mecbûrî T'irkîyê bûn, mecbûrî ît'îlafê bûn, lê naha ne mecbûr in! Anha ezê pirseke dinê li te bikim, Mazlûm Ebdî li Qamûşlû ye, PYD li Qamûşlo ye, Xweserî li Qamûşlo ye, kesê ji minra bibêje, k'a hêzên dinê yên k'urdî li Şamê çi dikin? Yanî li Şamê tûyê çi nîqaş bikî? Di emran da Colanî wextê xwe ji bo te venneqetîne, ewê ji meclîs-medînekê bide te, û anegorî qanûnê wan, dê ji bo meclîs-medînê jî muhafizekî ji Şamê were. Her weha îro li Dêrezorê û Xomsê

wilo kirin. Merî di wir da divê hinekî zane be, hinekî qafê xwe bişixulînin, ku ewana dê tiştekî nedin we. Eger em bi qeweteke gêografî, bi r'êxistineke bi r'êk û pêk, bi civaka sivîl, bi hev r'a neçin Şamê, kesekê li me nenihêr'e...

Dilbixwîn Dara:

– Baş e, Zozan, eger PYNK û ENKS li hev nekin, li Şamê mafê k'urdan li ber p'iyan naçe?

Zozan Elûş:

– Çawa naçe, wê biçe! ... Li dîrokê binihêre, li Başûr, dema mafên k'urdan dan, herdu partî li hev r'ûniştin, gotin – na, ez ji te hez nakim, tu ji min hez nakî, t'emam, lê, em dikarin li ser hin tiştna li hev bikin, û gor wê di destûrê da sîstêma fêdêralî p'ejirandin, û heya naha jî li başûrê K'urdistanê herdu partî bi wê destûrê jîyan dikin. Lê, ku partî t'enê biçûya û YNK jî t'enê biçûya, wê tiştek dest nexistana...

Dilbixwîn Dara:

– Baş e, wê demê ji PYNK çi tê xwesti, divê çi bike? Yanê li gel ENKS-ê li hev werin, îqina bikin, ku mafê k'urdan li ber p'êyan neçe, divê çi bike?

Zozan Elûş:

– ... Divê destpêkê evên di ît'ilafê da cîhê xwe digirin, evên li Şamê herin Qamûşlo! Îro ji bo çûyîna Qamûşloyê t'u muşkule t'une. – Û li vira Dilbixwîn dipirse, k'a k'î divê her'e Qamûşloyê? *– Zozan navê çendekan dide: Îbrahîm Biro û Hekîm Beşar, û didomîne... Ew di Şamê da Çi dikin? Qet tiştekî nakin. ... T'irkîyê destê xwe ji wan k'işandye, kesek bi wan r'a nîqaş nake. Naha li Sûrî quwet hene: qiweta Heyet Tehrîr eş-Şam heye, ew li Şamê ye, qiweta QSD li r'ojhilatê bakûrê Sûrîyê ye, k'omên girêdayî bi T'irkîyê r'a hene, heya naha li r'û erdê t'u pirsgirêk ji HTŞ r'a çênekirine. T'irkîya van mitafiqên xwe ji dest xwe bernade...! Her weha, kek Dilbixwîn, evên ku li Şamê ne, Ahmed Şeraa wan nabîne, naxwaze wan bibîne!* – Û li vira Dilbixwîn careke dinê li ber gotinên Zozanê da tê.

Dilbixwîn Dara:

– A-ha! Serokê ît'ilafê dibêje, divê PYD xwe ji PKK qut bike, yanî, ji bo r'êkevtinek çê bibe! Tu vê yekê çawa dibînî?

Zozan Elûş:

– Belê, yanî, anha ew Tehrîr eş-Şama li Şamê îdare dike, ew jî di heman lîsteya têr'orê da ye, ku PKK têda ye, r'ast e, ne r'ast e?! Her weha, ewên ku li Şamê r'ûniştine, siyasetek a wan a îslamî heye. Çima, dema xwevek'işandin tê axavtin, t'enê li ser PKK û ser k'urdan tê pêkanîn? PKK çil sal e, çilûpênc sal e, li Sûrîyayê heye. PKK ne xaleke nû ye li Sûrî! Sîstêmeke wê heye, şehîdên wê hene. Eger PKK xwe ji Sûrîyê vk'işîne, eger ew li Sûrîyê hebe, eger xwe vek'işîne, jêr'a amadek'arî lazim e.... Yanî, naha Îran ji Sûrî çûye? R'ûsîya ji Sûrîyê çûye? Hizbûllah ji Sûrî çûye? ... Îstixbaratên Sûrî k'anên? ... Ji bo wê jî, ez çi dibêjim, ... ez naha nizanim, mûşkula PKK bi Sûrîyê r'a çi ye? PKK di Sûrîyê da t'u şer'ê navxweyî nekirye, PKK di Sûrîyê da tiştekî dijqanûne nekirye, eger PKK li R'ojava heye, li Sûrîyê heye, PKK qeweteke navnetewî ye..., – li vira du caran Dilbixwîn xwest navberê bide axavtina Zozanê, lê ewê bi bir'yar ew da r'awestandin, – *kek Dilbixwîn, biborîne, em bibêjin, PKK-ê li Sûrîyê ye, t'emam, gelo, eger PKK-ê xwe ji Sûrîyê kişand, ...* – Û li vira careke dinê Dilbixwîn, li ber axavtina wê da hat.

Dilbixwîn Dara:

– Pir hêz..., Zozan xan, yanî T'irkîya vê dixwaze, Antonî Bilînkên duh ev got, yanî, wezîrê k'arê derva yê Emerîka, Ewropa vê dixwaze!

Zozan Elûş:

– Temam, ez bi te r'a me!

Dilbixwîn Dara:

– ... Ji bo ku ev pirsgirêka k'urdan têk'eve r'êyeke r'ast! Her kes vê yekê dixwazin, ku PKK-ê li R'ojavayê K'urdistanê heye, ji R'ojavayê K'urdistanê derk'eve. Ji bo k'urd li R'ojavayê K'urdistanê bibin xwedî maf.

Zozan Elûş:

*– Ez jî pirseke dinê dipirsim, kek Dilbixwîn, ez dibêjim, îro, eger PKK li Sûrîyê heye, tu dibêjî, ku PKK li Sûrîyê heye (*Dilbixwîn dik'eve nava axavtinê *– ew dibêjin!), t'emam, ew dibêjin, dema mafê min, li Sûrîyê (bên binp'êkirin), wê k'î min bip'arêze? –* Pıştr'a ew di derbarê hinek r'ê û r'êbazan da diaxive, lê Dilbixwîn axavtina wê dibir'e, xatirê xwe dixwaze û ji bernamey dertê...

Bi r'astî, mirov dixwaze biqîr'e – ma, k'urdîtî jî weha dibe, ma mirovî jî weha dibe?

Pêwîst e, ku her mirovekî xwedî heş û sewda, xwedî hest û r'aman van gotinên Dilbixwîn bibihê: *"... Ji bo ku ev pirsgirêka k'urdan têk'eve r'êyeke r'ast! Her kes vê yekê dixwazin, ku PKK-ê li R'ojavayê K'urdistanê heye, ji R'ojavayê K'urdistanê derk'eve. Ji bo k'urd li R'ojavayê K'urdistanê bibin xwedî maf"*.

De, îjar were, û ...!

A, pıştî vê, bi dîtina min, êdî bes e, ku em – k'urd bi hev r'a dîplomasîyê bikin! Divê em bê dîplomasî ji hev r'a r'astîyê bibêjin, ew çiqasî tal dibe, bila bibe – ji bo xatirê nivşên dihatûyê, ji bo xatirê pêşer'oja gelê me!

Lewra jî, ez dipirsim: ma ew k'ê R'ojavayê K'urdistanê gîhand vê astê, k'ê ew nivş bi nivş bi r'ûhê berxwedanê p'erwerde kirin, k'ê ji bo wê ewqas p'akr'ewan dan, k'ê di Kobanîyê da pişta DAÎŞÊ şkênand? – Her mirovekî xwedî wijdan û xwedî r'ûmeta mirovî dê bibêje – PKK!

PKK ji derva nehatye! Belê, r'ast e, ew formal di Bakûrê K'urdistanê da hatye damezirandin, lê wek r'êxistinek a net'ewî ya serk'êş, bi bingehîn di Sûrîyayê da, di R'ojavayê K'urdistanê da pêşk'etye. PKK ne partîya beşekî K'urdistanê ye, û ewê hîç demekê jî xwe wisa nas nekirye û anegorî wê t'evneger'yaye! Ew partîyeke t'evahîya K'urdistanê ye, û mafê hîç kesekî nîne, ne ku t'enê di derbarê xwevek'işandina ji R'ojava da bibêje, heya divê ew neyê ber heşê wî jî! Ev Sûc e – sûcê dijî mirovahîyê! Hebûna PKK-ê mercê p'arastina mafên gelê kurd e, heya mercê hebûna wî bi xwe ye! Ji ber ku R'ojavayê K'urdistanê, wek ku ew îro heye, ew berhemê îdêa û r'amên PKK-ê ye, û ew r'astî ewropîyan û nûnerên welatên dinê li ber ç'avên xwe dîtine!

Di derbarê vê pirsê da ez heya dawîyê li ser vê dîtinê me û ezê ji vir û pêva jî vê dîtina xwe bip'arêzim, çi dibe, bila bibe, hizdikî, bila cîhan jî serobin bibe!

Helbet, ev helwesta min a mirovî ye – wk pirênsîp! Lê, wek ku tê zanîn, helwestên wisa, ew çiqasî jî r'ast û mirovî bin, di hinek r'ewşan da ji bo ç'areserîya pirsgirêkan nikarin bibin r'ênîş û r'êgez. Ji bo pirsên wisa divê bir'yarên pêwîst bi serê sar bên girtin…

Û, dema ev gotar êdî amade bû, min ew ji bo weşanê r'êdakte û amade dikir, daxwîyanîya endamê Konsêya R'êvebir a PKK-ê bir'êz Dûran Kalkan di vê derbarê da hate weşandin.

Wek ku ez tê gihîştim, r'êvebirîya PKK-ê baştir haş ji r'ewşa sîyasî ya R'ojavayê K'urdistanê û t'evahîya herêmê heye. Di derbarê axavtinên hinek derdoran û, bi t'aybet jî, helwestên spêkûlatîv ên hinek hêzên der û hindur' ên li hember vê mijarê da agahî li ber destê wan hene. Û ew jî, jixwe xwedî t'ecrûbeya pêkanîna nirxandin û analîzên siysî ne. Lewra jî, ji bo ku di vê r'weşa herêmê ya alozda da ev mijara wek karteke sîyasî ji hêla hinek hêzên navdewletî û herêmî va li dijî R'ojava û R'êvebirîya Xweser a Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê neyê k'aranîn, R'êvebirîya PKK helwesta xwe li hember vê mijarê bi zimanekî dîplomasî diyar kirye.

Weha di daxwîyanîya enda mê Konsêya Rêvebir a PKK-ê bir'êz Dûran Kalkan da çi tê gotin:

"… Heval Mûrad Karayilan jî r'agîhand, r'astedêr têk'ilîyên me bi R'ojavayê

K’urdistanê r’a nînin. Eger k’urdên ne ji Sûrîyê hebin, û ew kes bi PKK-ê r’a têk’ildar bin, eger r’êvebirîya Bakûr-R’ojhilatê Sûrîyayê bir’yar bigire, ew ji qadên wan derk’evin, ewê derk’evin. Ango, bi t’aybetî ji bo PKK-yan t’u pirsgirêkek nine. Ewê werin, ç’ekên xwe bigirin û derbazî Bakûrê K’urdistanê bibin. Jixwe berê, ji bo ku li R’ojavayê K’urdistanê li dijî DAÎŞ-ê bitêk’oşin, ewana çe’kên xwe hildabûn, ji Bakûrê K’urdistanê derbaz kiribûn, hatibûn R’ojavayê K’urdistanê. Jixwe demborî ji her kesî zêdetir haya Teyîp Erdoxan ji vê yekê heye. Ji bo me pirsgirêk nine. R’êvebirîya Bakûr-R’ojhilatê Sûrîyayê jî divê serê xwe neke belayê, bila nek’eve tengasîyê, bi vî şikilî nikarin, zextê bidin ser R’êvebirîya R’ojavayê K’urdistanê …”

Ango bir’yar a nûnera îradeya gelê Bakûr-R’ojhilatê Sûrîyayê – R’êvebirîya Xweser e, ne ya “her kes”-ên ku Dilbixwîn behsa wan dike!

Hat têgihîştin! Ew kart, a ku hinekan dixwastin li dijî R’êvebirîya Xweser a Bakûr-R’ojhilatê Sûrîyayê bidin lîstikê, R’êxistinê bi dîplomasî ji destê wan derxist!

Ji bilî wê, îro di R’ojava da hîç kesek nikare bibêje, ev PKKî ye, ev – na! Di navbera van 45 salên dawîyê da bi dehan nivş bi r’uhê PKKê ghîştine.

Û, dîsa jî, eger em bibêjin, PKK ji R’ojava çû, hûnê k’ê bînin, li wir cîh bikin – daîşîyan (wek di Efrînê da!), van peyayên r’êjîmê, yên ku “maeşê Apo” ji T’irkîyayê digirin? Ê-ê, wê demê k’îyê welatê wêrankirî jinûva ava bike? Evên han fêrî avakirinê nebûne, ew hîn bûne, xizmeta r’êjîmê bikin, bifiroşin, xiyanetê bikin û ji bo wê meaş, ê ku tê azîn, bistînin!

Û ya dinê, min dixwast di derbarê tiştek dinê da jî ji vî biraderî bipirsya:

– Eger PKK nînbe, dê ji bo çi r’êjîma T’irkîyaê her meh ewqas p’ere bide ewqas mirovan, wan xwedî bike – ji wan, ên ku li Bakûr mûçeyên xwe yên mehane “maeşê Apo” nav kirine, heya bê derê van hemû sazî, r’êxistin, dezgeh, weşan, têlêvîzîon û r’êvebirîyan, ên ku di bin navên cuda yên qaşo k’urdî da di xizmeta r’êjîma faşîst a T’irkîyê da ne û bingeha yekîtîya net’ewî diher’ifînin, her çiqas hûn herr’o bi dengekî bilind di derbarê wê yekîtîyê da dibêjin?!

Minê ev vêdêo, ya ku wek hevp’eyvîn tê zanînm *gengeşî, an dîskûsîon (nîqaş)* a di navbera Dilbixwîn Dara û Zozan Elûşê da nav bikira, û wek manşêt jî, minê ji van gotinên Zozanê hilbijarta:

“PKK hêzek a navnet’wî ye!”

“Mazlûm Ebdî li Qamûşlû ye, PYD li Qamûşlo ye, Xweserî li Qamûşlo ye! Kesê ji minra bibêje, k’a hêzên dinê yên k’urdî li Şamê çi dikin?”

“Eger PKK ji Sûrîyê her’e, k’îyê mafên min li wir bip’arêze?”

Ji vir û pêva gotin ya we ye, xwendevanên hêja!

Lê tiştên balk’êş hê dawî nebûne...

Gelek caran di nava me da hinek mirov hinek tiştan dikin, mirov dibêje – dema ên weha di nava me da hene, hîç hewce jî nake, ku dijminên me hebin!

Bi r’astî, mirov pê diêşe!

…Û hema dema ev r’amanên t’evlihev di serê min da diger’yan, dema min dixwast têbigihîjim, k’a, gelo ev hemû çawa îro di nava me da pêk tê, di Youtube da stranek a bi ala k’urdî xemilandî û bi sernavê “Li gilî û gazindên gel û welatperweran guhdar bin” li ber ç’avê min k’et. “Şivan Perwer” tv ew belavkiribû. Ewê bala min jî k’işand: (https://www.youtube.com/watch?v=hgjr7EfzQ08).

Min jî ew bi baldarîyek a mezin guhdar kir! Min xwest, bizanibim, k’a ew çi gilî gazindên gel û welatp’arêzan in, ku t’abetîyê nadin vî biraderî... Eger bibêjim, ez matma bûm, bizanibin, min tiştekî ji we r’a negot. Dibe ku dengbêj-pesinbêjên axa û begên sedsalên navîn jî destûr nedana xwe, ku tiştekî wisa yê arzan û hûr li hev bianyana û diyarî patr’onê xwe bikirana! Û, eger yekî tiştekî wisa bistira jî, ji sedî sed axayê wê demê dê berî wî bida û nehîşta, ku ew ji wir û pêva nêzîkî konê wî jî bibe.

Ev stran bi serê xwe ne ku t’enê bi naver’okê va ne anegorî hest û hêvî û xiyalên gel e, lê, her weha, bêr’êzîyek e li hember wan mirovan, ên ku ew wisa pesnê wan dide, lewra

ku pesn û met'hên ku di vê stranê da tên gotin, p'ir' sade (prîmîtîv, basît), gundîyên meyê bigotana, şir'o-vir'o, bêwat'e û vala ne. Ji bilî wê jî, ew gotin û r'astî p'ir' dûrî hev in! …

Bi r'astî, dilê mirov diêşe – k'a ew Şivan, ê ku diqîr'ya: "K'î ne em!", "Hevalê bargiran im, hevalê şoreûvan im!" "Welat çiqas xweş û r'ind e! ...", "Wey, li min!" …

Belê, sed heyf û mixabin! … Heyf, kû Şivanê îro ew Şivanê duh bi wat'eyî kuşt û t'une kir, ê ku demekê bi p'eyv û gotinên seydayê Cegerxwîn û yên gel distra û bibû dengbêj ê hezkirî ji bo gelekan… Û îro ewî bi xwe, bi van helwestên xwe, bi vê strana xwe da xuyan, ku ew Şivanê berê xiyalek bûye, ya ku zêde dirêj nedomyaye, çiqas jî ew mezin kirine, di dawîyê da ew veger'yaye ser bingeha xwe ya r'ast! – Û îro ev strana bûye nasnameya r'astîn a wî biraderî – wek stranbêj!

Binihêr'in, di van r'ojên tarî û giran da, dema dagerker û mêtînger wek gurê har li gelê me hatine hev, dema di R'ojavayê K'urdistanê da gelê me şer'ê man û nemanê dike, û li şûna wê, ku Şivan, wek stranbêjekî gelêrî, îro di nava wan da bûya, dil bida wan, bang li serok û r'ayedarên hemû beşên K'urdistanê bikira, ku destê piştgirîyê dirêjî R'ojava bikin, tiştine weha dibêje:

… R'ojava ne cîyê şer' e, ez dibêjim jwe r'e,
k'urda nebin wê Dêrê, t'u şerê we wê derê!
Serî nedin ber k'êrê, ev çi k'arê we bê r'ê,
dinya dem û dewran e, k'arê bêr'ê p'oşman e,
dê bibêjim dil û can Dêrê nabe K'urdistan,
gel hûn bikin bi ya min, ereban nekin dijmin,
em welatîyê hev in, em xal û xarzîyên hev in,
em t'ev xelkê sûrî ne, sînor di nav med nine…
em hindik in, nikarin, dijmin ne yek in, çar in,
tştê ji me tê xwestin, gotinên çewt r'awestin!
Ez dibêjim bi r'indî, kesek me nabe xwedî,
ji bilî r'ya Hewlêr, Barzanîyê xwedî xêr.
Bi lez her'in bal serok, herin Hewlêr û Duhok!
Bi serok bişêwirin, ji bo Şamê hûn her'in.
Derfet hatî, bernedin, serk'evtî sedî sed in.
Di saya wî Barzanî t'ucar nine p'oşmanî,
ew serokê net'ewî, kesek nine mîna wî,
ev r'êbaza Barzanî, k'arê wa birivanî…
ev r'êbazan Barzanî zagonek jxwera danî,
qedexe kir birakujî, xwîna k'urda birijî,
t'imê xêrê dixwazî, ji bo k'urdan azadî…
hûn jî bibin wekî wî, r'emz û hurmet ji bo wî.
Ez ban dikim ji k'urdî, li hevdu bibin xwedî.
Ban kin t'evayê partî, wer, bikin yekîtî,
bê yekitî, zanebûn, kesek nabe serxwebûn…– Û ji bo ku gotinên wî li şûna r'astîyekê bên p'ejirandin, ew gotinên siloganî yên kevn û xilmetbûyî bi gotinên seydayê Cegerxwîn tîne bal hev: *…ger hûn nebin yek, hûnê herin yek bi yek*! –

Bila xwendevan biborînin, ez çiqsî ji stranê têgihîştim, min ew r'avekir û nivîsî, cî-cîna heya mirov tê jî nagihîje, k'a ew birader çi dixwaze bibîje…

Her çi jî hebe, hewlên "R'ûdaw tv, yên stranbêjekî mîna Şivan P'erwer û hinek kes û

kesayetîyên k'urd ên dinê, yên ku di vê r'ewşê da, eger nerm jî bê gotin, ne dik'evin xizmeta yekîtîya net'ewî, ne jî, hîç nebe, piştgirîya moralî didin gelê R'ojavayê K'urdistanê, berovajî vê, di nava gel da bêbawerîyê û bêmoralîyekê diçînin (ew jî, di bin gotinên "welatp'arêzî"-yê da!).

Mirov nikare têbigihîje – ji bo çi? Armanc çi ye?

Ji bo ku berê gel ji r'êya wî biguhêr'in?

Û ev jî ne bes e, wek ku Dilbixwîn di "R'ûdaw" tv da "r'adigihîne", ...naha enîyeke nû hatye avakirin: bi navê "Enîya K'urdistana Sûrîyê". T'eze ava bûye! – Ew didomîne. – Ji ber xetayên vê dawîyê yên li R'ojavayê K'urdistanê û Sûrîyayê çê bûne… Programeke siyasî, destûrek amade kirye evê enîya nû. – Ew dibêje û çend xalên, qaşo, wê destûrê tîne ser êkranan û bi xwe jî dixwîne… Ez wan xalan li vira r'êz nakim, lewra ku ji xwendevanên hêja r'a r'êz digirm, dizanim, her mirovekî ku di dema xwe da çûbe dibistana navîn (lîse), û xwendineke wî ya astekê hebe, xazma vê dewra me ya kompyûtêr û întêrnêtê, dikare di gundekî dûr da r'ûnî û di nava şevekê da ji bo çend t'evgerên li ser kaxzê damezirandî xalên wisa ji întêrnêtê berev bike û r'êz bike, ku…! Hema ev tiştek e, lê enî (tevger) avakirin, û ji bo wê bername an destûr nivîsîn, tiştekî dinê ye. Bi gotinekê, xwendevan bi xwe dikarin ewê "bernameyê" li vira binihêr'in: https://www.youtube.com/watch?v=DXdSQ1kviQ4

Ewqasî jî nabe, mirov divê ji vî gelî r'a bêr'êzîyê neke! Ma, sedsalên Navîn in? Mirov îro nikare zar'okên dibistana seretayî jî bi vî awahî bixapîne!

Di R'ojavayê K'urdistanê da ev donzdeh-sêzdeh sal in, têk'oşînek heye – di destpêkê da li dijî r'êjîma baasî, paşê li dijî DAÎŞ-ê. T'enê di şer'ê dijî DAÎŞ-ê da R'ojava zêdetirî donzdeh hezar cangorîyên p'akr'ewan dane! Di encamê da wana bi xwe r'a wisa jî hinek navçeyên dinê yên Sûrîyayê r'izgar kirine, r'êvebirîyeke xweser ji bo Bakûr-r'ojhilatê Sûrîyayê avakirine, bûne hêz û sazî. Ango, ew hemû bi têk'oşîneke bêhemp'a, di nava agirê şoreşekê da gihîştye û qal bûye. Û, dema li Ankarayê û Ewropayê tiştên weha r'û didin, mirov matma dibe, û bêyî r'ayê xwe dixwaze bipirse: "Evan mirovana li xwe dik'enin, an li gel?" – Di R'ojava da sazî û dezgehên dewletekê hatine avakirin, r'êvebirîyek a gel a xweser hatye danîn, hêzeke p'arastinê heye, û ev hemû dikare ji bo dihatûya Sûrîyake dêmokratîk bibe bingeha sereke. Û piştî ewqasîû li derveyî Welêt hinek r'abûne, û van holimaç'kên zar'okan li ser kaxezokan ava dikin – de, îjar – encaman, de, îjar – enî!

Û li vira pirs bi xwe r'ûdide – ji bo çi?

Helbet, tê zanîn – ji bo ku hêz û t'evgera R'ojavayê K'urdistanê bi xwe va mijûl bikin, û ji bo pêkhatina wê bibin asteng! Hew! Heş û sewda (mant'iq, eger dixwazin!) bersîvekê dinê nabîne!

Û, ji bo ku li pêşîya pêvajoyên xweserîyê yên li R'javayê K'urdistanê bibin asteng, vê carê R'êjîma T'irkîyayê bi hevk'arîya r'êvebirîya Başûrê Kurdistanê (bixwîne – PDK!) ev, a ku jêr'a ENKS dibêjin, hinartine û berî bedena R'ojavayê K'urdistanê dane… Û hemû derfet ji bo wan afirandine (bila serê hesabên ji firotana sererd û binerdê K'urdistanê xweş be, yên ku PDKê di bankên T'irîyayê da r'azandine! Jixwe K'T wan hemûyan ji bo şerê qir'êj ê dijî gelê k'urd k'ar tîne!), ji bo wan di Ankarayê, Stambûlê, Şamê û deverên dinê da ofîs vekirine. Ji bo k'arê dijî r'êvebirîya xweser a R'ojava bi r'êk û pêk bikin, hemû sazîyên çapemanîya Tirkîyayê kirine xizmetê (ji xwe di bin navê r'ojnamegeran da k'arbidestên MITa t'irk di Başûrê K'urdistanê da serbest k'arê xwe yê sîxurîyîyê pêk tîne!), û ji bo ku evî k'arî xurttir bikin, heya di bin navê k'urdan da têlêvîzîon kirine k'ar…

Belê, îro, di vê serdema bi nak'ok û t'evlihev da, dema bir'yara ç'arenûsa gelê R'ojavayê K'urdistanê tê dayîn, "R'ûdawê" daw û delingên xwe hildane jor û k'etye nava liv û t'evgerê… Propaganda wan sazî r'êxistinan dike, yên ku ji hêla MITa T'irkîyayê û PDK-ê va li derî Welêt li ser k'axezê hatine hinartin.

Û Şivan jî ji wan paş namîne, ew bi strana xwe ya vê dawîyê bang dike, ku:

...R'ojava ne cîyê şer' e, ez dibêjim jwe r'e,

k'urda nebin wê Dêrê, t'u şerê we wê derê!
Serî nedin ber k'êrê, ev çi k'arê we bê r'ê,
dinya dem û dewran e, k'arê bêr'ê p'oşman e,
dê bibêjim dil û can Dêrê nabe K'urdistan,
gel hûn bikin bi ya min, ereban nekin dijmin…

Ango, ev biradera vekirî banga xwesparîyê dike, û k'urdan bi dijminatîya bi ereban r'a ditirsîne. Hemma, mabesta vî propagandîstî k'îjan ereb in – ew behsa erebên daîşî dike, an gelê sivîl, ê ku ji hêla hêzên k'urdî va ji zulm û zordarîya DAÎŞ-ê hatye r'izgarkirin û p'arasti? – Mirov nizane, çap û pîvanên mirovahîyê û mirovbûnê li bal vî mirovî berovajî bûne, an ew bi zanebûn, bi sipsrîş vê r'ola xwe pêk tîne?!

Û yeke dine jî, binihêr'in Şivan berê k'urdan dide k'u:

Ez dibêjim bi r'indî, kesek me nabe xwedî,
ji bilî r'ya Hewlêr, Barzanîyê xwedî xêr.
Bi lez her'in bal serok, herin Hewlêr û Duhok!
Bi serok bişêwirin, ji bo Şamê hûn her'in.

– Bi r'astî mirov nikare mabesta vê bangê têbigihîje, heya ew nak'eve serê mirov jî! Lewra jî, ji bo ku mirov bixwaze mabesta vî mirovî tê bigihîje, destxweda r'êzek pirs r'ûdidin:

– Baş e, eger, em bibêjin, k'urdên R'ojava çûn Hewlêr û Dihokê li bal *"Barzanîyê xwedî xêr"*, ewê çi ji wan r'a bibêje? Dê wan hîn bike, çawa R'ojava di nava xwe û wan encaman û enîyên ji hêla Zanîyarîya PDK û MIT-a T'irkîyayê va li ser k'axezan hinartî da p'arç'e bikin? Ma we jibîrkirye, çawa wezîra k'arên derva ya Amêrîkayê Madlên Olbrayt' hewl da ku di Başûr da Yekîtîyek çê bike, lê hê jî di navbera Behdînan û Soran da sînor heye – wek sînorê di navbera du dewletên da – bi kontrola paseportan va! Ku hê jî her partîyek pêşmergeyên xwe hene, ku di Başûr da hê jî art'êşeke yekgirtî nine! Ku demekê, dema serokê Palamêntoya herêmê (yê ji partîya Goran) xwestye ji Silêmanîyê her'e Hewlêrê – ser karê xwe, pêşmergeyên PDK-ê li ser sînor ew veger'andine, nehîştine, ku her'e Hewlêrê. Hûn dixwazin R'êvebirîya xweser a R'ojava vê ji Hewlêrê hîn bibe?

Wezîra k'arên derva ya DYA Madlên Olbrayt' Mesûd Barzanî û Celal T'elebanî tîne bal hev û ji wan r'a dibêje – destê biratîyê bidin hev!

An, bi r'êvebirên r'êjîma faşîst a T'irkîyayê r'a t'evgerên leşkerî pêk bînin? Û li dijî k'ê?



An, çawa sînorên xwe li ber k'urdên beşên K'urdistanê yên dinê bigire, wek ku wan Derîyê Sêmalkan li ber R'ojava girtye?

An, di bin navê r'êfêrêndûmê da beşekî xaka R'ojava r'adestî DAÎŞîyan bkin, wek ku wan di dema xwe da beşekî Bşûr bi dest Bexdayê va berda?

Helbet piras r'êfêrêndûmê bi serê xwe sûcekî giran bû li hember gelê k'urd, a ku hê jî ji hêla me k'urdan va nehatye wat'edarkirin…

Lêbelê, pirsên di derbarê van bûyerên dîrokî da li cîhekî da neçûne!

Wek ku tê zanîn, ji bo serxwebûnê r'êfêrêndûmek hê sala 2005-an pêk hatibû, û ji

sedî nodê binecîyên Başûrê K'urdistanê dengê xwe dabûn serxwebûna xwe… Her dima, ku encamê wê r'êfêrêndûmê di Parlamêntoya Herêmê da bihatana p'ejirandin û serxwebûna herêmê daxwîyandana. Lê r'êvebir û r'ayedarên Başûr li ser vê ç'avê xwe girtin û piştî 12 salan amadekarîyên r'êfêrêndûmek a nû kirin. Pirs dertê holê– ji bo çi? Her çiqas di cîhanê da û di nava k'urdan bi xwe da deng dihatin bihîstin, ku naha ne dema r'êfêrêndûmê ye, lê, dîsa jî, bir'yar hat girtin, wê pêk bînin (di vê derbarê da bi hûrbînî – di virda ye – https://amidakurd.net/ku/tekst/R_ÊFÊRÊNDÛM_PÊK_HAT_PAŞÊ). Ên ku ev bir'yar dane, an ji bo vê pirsê nedestûrmend bûne, an jî bi zanebûn her tiş berbi valaderxistina wê va birine. Binihêr'in, Îraq dewletek a sûvêrên e, endama R'êxistina N'etewên Yekbûyî ye, Destûra wê ya bingehî heye, û di wê destûrê da (xala 140-î) hatye nivîsîn, ku ji bo navçeyên bi gengeşî, divê di serî da r'êfêrêndûmên navçeyî bên pêkanîn, her piştr'a – ya herêmî-gîştî. Û ev qanûnek e, ya ku ji hêla Herêma Başûr va jî hatye p'ejirandin. Wê demê çima çûn r'êferêndûmekê, ya ku hema di destpêkê da ne pêkan bû? Ji bo ku bi wê r'êfêrêndûmê encamên a 12 sal berê ji holê r'akin? – Nizanim, em – k'urd, wek net'ew, mafê me heye, evê pirsê ji bo xwe zelal bikin, ji ber ku ev ne pirsaa r'êvebirîya Başûr t'enê ye. Dibe ku paşê hê dereng Dadgeheke k'urdî-net'ewî ji bo darizandina sûcên li dijî gelê k'urd bê damezirandin, di nava wan da wisa jî ev pirs bê bihîstin. Ne ji bo xatirê cezakirina hinekan, her ji bo derxistina dersên dîrokî, wek net'ew!

Û t'erfekî pirsê yê dine jî: ma hukumeta Îraqê ya wê demê nizanibû, ku r'êfêrêndûneke wisa ne pêkan e, ewê çima anegorî xala 140-î r'ayedarên Başûr hişyar nekirin? Ev jî bi serê xwe pirsek e. Û bersîvên wê jî hene:

– An ew jî ne di zanebûna pirsê da bûne. Ango, nedestûrmend bûne!

– An jî, wan dizanibûye, lê bi zanebûn deng nekieine, kû r'êfêrêndûma k'urdan a ji bo serxwebûnê bê encam bimîne!

Lê, eger ev hemû komployek e?!

Lewra jî, ez dixwazim ji van biraderan bipirsim, ên ku têlêvîzîonek kirine hêmana fişara derûnî li ser R'ojavayê K'urdistanê û yên ku pesn û met'hê wan *"xudanên xêran"* didin, û bangên bê wat'e ji bo R'ojava dikin:

– Hûn heya naha li k'u bûn, dema ev hemû li Başûrê K'urdistanê pêk dihatin? Ma hûn ne li wir bûn, heya beşdarî van nedibûn, we ji wan r'a çepik lênedidan, pesn û met'hên vala û bêwat'e pêşk'êşî wan biraderana nedikir? Ji bo çi we şêwreke qenc li wan nedikir, r'êyeke r'ast nîşanî wan nedida – ji ber ku we bi xwe jî nizanibû, k'a r'êya r'ast k'îjan e û ew li k'u ye, an hîç xema we nînbû, ka ew biraderana di welatê weda çi dikin?

Ev pirs hr'êtorîk in, bersîva wan di wan bi xwe da hene.

Mirov li vira her tiştekî dikare bibêje – bi erêkirina we ya bêdeng, bi ç'epik û pesnên we yên vala û bêwat'e, welatê me îro gihîştye vê r'ojê!

Wekî dinê – mafê gotinê yê xwendevanên hêja ye!

Û – li şûna gotina dawîyê:

XEWN

… Çiqas xewneke giran bû, Xwedê, –
Ev û ew cîhan t'evî hev bibûn, –
Bi ç'îk û kenc bû ew xewna, Xwedê,

Bi tep û tengî û bi hêbet bû…
Xewn bû … yan hişyar? ...
Ç’avên min hê nû pêgihandibûn
Her’in ser hevdu:
Ez xilmaş bibûm –
Xwe bû, yanê – xewn…
Yan ez hişyar bûm?...
Ez baş r’uh naynim!
…Girmîna defê,
Qûr’îna zur’nê…
Heralî hêle û hingirme bû:
Keç’ û xortên k’urd
Wir çît girtibûn –
Ger’ek merdane l'navê hiştibûn…
Û jineke bi k’ofî-k’itanên
Meye kurmancîyê k’aw wergirtî bû,
Lê bê p’ergal bû…
Bisk û kezîyên wê li ser ç’avan da –
Wa hatibûn xar,
D'bin dengê ewê def û zur’nê da
Ç’epil hildabû û dir’eqisî…
(Nizanim, xewn bû,
Yan ez hişyar bûm?!)
Awaz, tuyê bêjî, yê kurmancî bû,
Lê dîlana wê?! –
Ya Xwedê, çi bû? –
Her we bidîta,
Weyê bigota:
– R’ast jî dîn bûye,
Tepa dik’eve!...
Ça-a dir’eqisî,
T’oz û xubara ewan der-doran
Pê der-dawên xwe
Ça-a l'xwe wer dikir…
Û b'zerp dik’enya:
– He-he, he-he-he! –
Lîqînîya wê bû…
D'hewê da ewê
Ç’eplên xwe wis nermik tew dida!
(Ya Xwedê, çito bedewîya nedî!)
Dîsa dik’enya…
T’ev wa matmayî dorê civyabûn
Û lê dinhêr’în…
Ez jî pêşva çûm,
Û serê xwe nava milên wana r’a
Berbi hindur’ kir û lê nihêr’î.
Ew jî veger’ya, ç’avê xwe ger’and…
Raç’ev kir – Dîtim!
– Ey, – got, – lawê min,
Çima tu wisa şaş-matma bûyî?...
Ez im dayka we –
K’urdistana te…

Ji kul û derdan êdî dîn bûme!...
Ç’avêm d'xewê da,
Ez wa vek’işyam…–
Ewê carek din çerx da govendê,
Govenda meye k’aw-naz nihêr’î,
Berbi min mêl bû:
– Na, t’ifalê min,
Ji min metirse,
Pêşva were, ha,
Hê dîn nebûme…
Lê bêy wê nabe!
Û ewê t’erka dîlana xwe da,
L'ber min kundveda,
Bi ewan t’ilîyên xweye mûmanî
P’or’ê min t’evda…
– Ax, lawên mine hêsîre sêwî,
Hûn matma bûne?...
D'vê cîhanê da,
Ji bo bighîje azadîya xwe,
Pêwîst e, mirov hinekî dîn be!...
Ax, çi teyaxî li dilê we ye,
Her yekî j'xwe r’a serî hildaye,
K’etye qulç’ekî – hêvîya demê ye?!
Û dem tên-diçin, lê hûn hêvîyê ne!
Hûn hê hêvîyê ne, lê dem tên-diçin! ...
Û evên nemerd
Erd û axa we çartîş kirine:
Dişewitînin, lê hûn hêvîyê ne,
We dizêrînin, lê hûn hêvîyê ne,
We darda dikin, lê hûn hêvîyê ne…
… Û hûn hêvîyê ne!
Lê dijminê me –
Devxwîn, hov û har,
Dema pêwîst be,
Hemû dibin yek,
Dema pêwîst be,
Me l'ser tîşekî
Yek dizêrîne,
Hela ne bes e,
Bi fir’okên xwe dajo tîşê din –
Alî zork’arê wî tîşî dike!
Jehra hinartî l'wir dir’eşîne,
L'wir direşêîne jehra hinartî –
Biç’ûk-mezin va me dişewtîne,
Gund û bajaran tarm û tax dike…
Lê hûn hêvîyê ne,
Lê em hêvîyê ne –
Hêvîya dema xwe! –
Ewê destê xwe berbi asmîn kir,
Demekê zûr bû li wir nihêr’î
Û paşê zûkya:
– Ya Xwedê, gelo Xwedê te heye?! ...

Ji ewî dengî ez bûme r'ussas,
Heya kevir jî pêda bûn hesîn,
D'cîh da lerizîn…
… J'cîh veciniqîm, ç'avê xwe vekir,
M'dît – li malê me,
Lê r'amana min – di xewna min da,
Hê p'erwaz dida – ez dibirim wir…
Û d'guhê min da dengê Dayka me –
Zîz û zelûlî dubare dikir:
– Û heya k'engê…
Û heya k'engê?!...

Korda Mad (Ezîz ê Cewo)

Gelawêj – R'ezber, 1987, Yêrêvan – Baykonûr
(Baykonûr Fr'egeha Sovêtê ya kosmîkî-astronavtîyê
ya here mezin bû di Kazakistanê da)

Û çend gotar ên di derbarê babetên cuda yên vê mijarê da:

– Gelo xiyanet hêza xwe ji k'u digire? – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/GELO_XIYANET_HÊZ_Û_WÊREKÎYA_XWE_JI_K_U_DIGIRE

– Cîhan divê amade be, ku faşîzma T'irkîyayê darizîne! –https://amidakurd.net/ku/tekst/CÎHAN_DIVÊ_AMADE_BE_KU_FAŞÎZMA_T_IRKÎYAYÊ_DARIZÎNE

– Êrîşên hevp'ar ên r'êjîma faşîst a T'irkîyayê û Barzanîyan li ser Herêma Xwep'arastinê ya Medyayê û dersên dîrokê –https://www.amidakurd.net/ku/tekst/ÊRÎŞÊN_HEVP_AR_Û_DERSÊN_DÎROKÊ û https://www.academia.edu/7814 3345/ ÈRÎŞÊN_HEVPAR_ÊN_RÊJÎMA_FAŞÎST_A_TIRKÎYAYÊ_Û_BARZANÎYAN_LI_SER_HERÊMA_XWEPARASTINÊ_YA_MEDYAYÊ_Û_DERSÊN_DÎROKÊ

– "Rûdaw" dîsa defa fitne û derewan dixe – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/rûdaw_dîsa_defa_fitne_û_derewan_dixe

– Xweserêya dêmokratî ya Şengalê û r'êfêrêndûma Herêma otonom a K'urdistanê – https:// www.amidakurd.net/ku/tekst/XESERÎYA_DÊMOKRATÎ_YA_ŞENGALÊ_Û_RÊFÊRÊNDÛMA_HERÊMA_OTONOM_A_KURDISTANÊv

– R'êfêrêndûm pêk hat. Paşê? – https://amidakurd.net/ku/tekst/R_ÊFÊRÊNDÛM_PÊK_HAT_PAŞÊ

– R'êfêrêndûm, serxwebûn û k'urd…– https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_ÊFÊRÊNDÛM_SERXWEBÛN_Û_K_URD